Divê em li hebûna xwe xwedî derkevin

D. Dilpîr

Piştî guhertinên nû li seranserî cihanê û bi taybetî di van deh- panzdeh salan de, pêşesazî bi gavine mezin bi pêşve diçe , tiknolociya di hemî waran de, bi berferehî, nemaze di hêla alav û dezgehê têkel û ragihandinê de dimeşin.

Îro-roj, kompiyûter bûye serdarê demê. Loma jî, cîhan weke gundekî biçûk lê hatiye. Mirov û miletan ev yeka ha ji bo hebûna xwe tewandin û berjewendiya civaka xwe pê diparêzin û pêşdixin , ziman, çand û koltûra xwe di nûjeniyê de diçespênin.

Vêca, em kurd ji vê şoreşa zanistî û tiknolociyê ka li kû ne?. Tevî ku, em ji her kesî bêtir pêdiviyê vê yekê ne . Lê, mixabin ta niha, sazî û alavên ku, bı zimanê kurdî dixebitin, hê di bin bandora ezîtiya partîtiyê de ne, bi taybetî Radyo û T.V yên ku bi berferehî bandorê dikin. Ji vê yekê, ez banga xwe didime rêvebirê van alav, û saziyan ku, wan bixin ber rajeya kurdayetiyê , bo parastina ziman û çanda kurdî . Erk û ustubarê niştimanî yê her kurdekî ye, ku li van saziyan miqatebe bêtir ji yên ku, ne bi zimanê me ne.

Lê mixabibin tu di malan de dibînî, ku guhdan li CD û kenalê bê sûd bihtir e, dengê strana -Yar Mêremê- yan jî Xwazgînîkê min hatine lê yadê. Ev jî tê kirin bi sedema serdemî û têgiştina zaravê T.V yên kurdî. Tevî ku me dît berî kenalên kurdî ronahiyê bibînin. Gelek keç û lawên ji ber temaşekirina kenalên Tirkî, hînî zimanê Tirkî dibûn û zimanê kurdî ji bîr dikirin. Ji vê yekê ez dibêjim divê hebûna me li ba me ji halo bêtir be .

Ebdula Pêşew

Hemreş Aştî

Helbestvanê vejîndar û dilsoz yê ku, bi zaravê soranî ristên xwe afirandine, bi tiliyên xwe yên zêrîn û ramanên geş wek kaniyeke ava zelal û paqij bide, di ezmanê rist û tora kurdî de bû stêreke evîndar.

Ebdula Pêşew, di sala /1947/ an de, li hêla bajarê /Hewlêrê/, li gundê /Bêrokê/ hate jînê. Di du saliya temenê wî de, bavê wî sala 1949 an koçbar kir, ji dêkê re ya ku, karê malê tev ketibû ser milên wê sêwî mabû.

Tirh, lemên hest, huner û torevaniyê, di dil û giyanê Ebdula Pêşew de kat dan, evîndariya welêt, têgihiştina perwerda vejîndariyê bûne mûmek û zindana jiyanê, jê re ronî kirin. Çimkî, di temenê/14/ salî de, wî dest bi nivîsandin û vehûnana rist û helbestên kurdî kiribû. Helbestên wî, di gelek rojname û kovaran de hatibûn weşandin .

Ebdula Pêşew bi zaravê soranî, helbestên xwe dihûnandin û hin helbestên wî bi zimanê Erebî jî dihatin weşandin. Dîwanên wî yên ku em dizanin hatine çapkirin /3 /ê ne. Dîwana yekem di sala /1976/ an de bi navê /BİRİN/ hatiye çapkirin. Piştre ,di sala /1978/an de, pirtûkeke din, ji aliyê wî ve hatiye çapkirin , pêşgotina wê mamoste Marûf Xeznedar bi gotinine hêja ristine.

Ebdula Pêşew, ji sala/1973/an ve, li yekîtiya sovyêt dijî. Li wir, ew bû endamê yekîtiya nivîskarên kurd û helbestên Boşkîn Lêrmantof, Feda Yasînın û Meksîm Gorkî werdigirîne zimanê kurdî.